Kuştina Du’a ya 17 e salî

Zîna şikakî

Mixabin, hê di nav kurdan de tê gotin : Ger filan kes mêr bûya wê namûsa xwe bişuşta ! heniya xwe hilmaşta ! serê xwe di nav xelkê de bilind bikira ! çêlek navê naxirekê xerab dike ! jinek navê êlekê xerab dike ! ma heqê wê dêlkê ne qurşîneke!

Hezkirin û kîn, kuştin û jiyan, mirovatî û hovîtî, serbilindî û ser-nizmî, rû-sipîkirin û rûreşkirin, bi guneh û bê guneh, şer û xêr, ronahî û tarîtî, binamûsî û bênamûsî. Di ferhengan de, gotinin dij hevin, û di navbera wan de tayek dezî ye, zû diqete, û mirovê nezan, zû-zû ji alîyekî derbasê yê din dibe .

Hezkirin rengek ji rengên nexweşiyê ye ; nexwaşiyeke bi lizet û xweş e ; kes nikare dijî wê bibê, û ne jî rûyê xwe li ber vê rastiyê reş bike, yek ji durv û xûyên mirovatiyê ye ; tu dara ku ba li sêrî nexin nînin. Kuştin jî rengek ji rengên nexweşiyê ye, lê hema nexweşiyeke pîs û genî ye .

Du’aya 17 salî çi guneh kiri bû? Ew bê guneh bû ; ên ku ew bi hovîtî kuştine gunehebar in. Tu gunehê wê tune bû, dilê wê tijî hezkirin bû ; dilê kesên ku ew kevir kirine, kuştine, tijî kîn bûn. Hezkirin ji miorvatiyê tê, lêdan û kuştin ji hovîtiyê tên. Dema mirov karên qenc bike, serê mirov bilind e, rûyê wî sipî ye ; zor, lêdan, kuştin serê mirovan nizim dike, û rûyê wan reş dike, wan gunehbar dike. Bênamûsiya mezin ew e ku keçikeka 17 salî bi wê hovîtiyê were kuştin. Di hemû reweşt û ‘adetên dunyayê de hezkirin qenci ye, xêr e, ne pîsitî û şer e, mirov, ji însanan, ji welatê xwe, ji Xwedê, ji jiyanê hez dike, ger keçek bi hezkirna xortekî navê êlekê xerab dike ! kuştina wê bi wê hovîtiyê , navê miletekî, gelekî xerab dike. Jin mirov e, jiyanê diyarî mirovan dike, kuştina wê ne mirovatiye, çawe emê mafên xwe yê mirovane daxwaz bikin ! û mafê mirovan biparêzin ! ger em mafê jiyanê ji jin, xûşk û qîzên xwe distînin .

Ev kuştina bi vî hawî, ne pênûs ; ne gotin ; ne hêstir ; ne sîlên ser çavan ; û ne jî kutên sîngan dikarin dilê mirov rihet bikin ; hiş û hestê mirov hêsa bikin, bêhna hovîtîyê ji vê kuştina hanê hildikele. Em ji welat, ziman, dîrok, û xwaka xwe hezdikin, dijmin me bi hovîtî dikuje ; lê ew dijmine ! şerên birakujiyê di navbera me de çê bûne, hema ew hizbîtî (partîzanî ye)! di dîrokê de ‘eşîr û malbet li hember hev rabûne şer kirine sedemên wê hebûne ; dewlet û hukûmet li hember hev radibin, şer dikin, bercewandî, û talankirin sedemên wê ne ; dijmanyetî hebûye. Lê hema kuştina keçeke (zarokeke ! ! ciwaneke) hefdeh salî li navîna kolan ê, bi lêdana keviran, bi destê nêzktrîn kesên malbata wê li ber çavên dê ! !, xûşk, xaltîk, met û jninên cîran ! ! ! dide ser hemî rengên hovîtiyê, ji ber ku hezkirin sedemek ji sedemên jor dûr e,

→